

Mafê tevayiyê li Swêdê

Li Swêdê mafê hemiyar heye- ger ew prîvat be jî; li nav surifltê bin,. Ji vê yekê re mafê tevayiyê tê gotin. Ev azadiyeke; ku li gel wê berpirsiyareke mezin heye; ew bi kurtî weha tê gotin Aciz meke – xira meke. Li vê jêrê tu dikarî bi kurtî li ser mafê tevayiyê bixwînî. Agehdariya dirêjtir li ser mafê tevayiyê yê swêdî ew bi swêdî, îngilîzî û alamanî di malpera Dezgeha Lênêrîna Surifltê de www.naturvardsverket.se heye. Herweha bi kurtî têkstek li ser mafê tevayiyê bi swêdiya sivik jî heye. Namîlkeyên agehdariya kurt li ser mafê tevayiyê bi swêdî, îngilîzî û almanî jî hene.

Bimefle, li piskilêtê û li hespan siwar be

Tu dikarî di nav surifltê de peyade bi rê ve biçî, li piskilêtê û hespan siwar bibî. Lê enkorên prîvat, flitil û erda çandî ew cihine qedexe ne. Enkor ew cihên ku li nêzîkî xaniyan in; yên ko li wir rûdinin mafê wan heye ku ew neyêne acizkirin. Pêdivî ye; ku tu li pey xwe derdîlk bigirî, dema ku bo nimûne tu di erdekî çêriyê re derbas dibî. Di rêçikên nerm û di erdên sist re li piskilêtê û hespan siwar mebe. Herweha di flopên bazdanê û skî re jî siwar mebe.

Wasîteyên bi motor û riyên prîvat

Qedexe ye; ku mirov awtomobilê, motorsîklê, mopêdê û makîneyên din yên bi motor li ser erda bê berf ya surifltî bajo. Erda surifltî hemî erdên surifltê, tevî li rêçan, rêçikên bazdanê û rê û rêçikên peyade ne. (Dibe ku mirov motorên berfê bajo; bi tenê dema ku ti xeter û ziyar li ser daristanê û erda di bin berfê de nebe. Li hin deveran yekcar qedex ye; ku mirov motorên berfê bajo, an bi tenê dibe ku ew di riyay motorên berfê re bête ajotin.) Herweha dibe jî ku qedexe be, mirov wasîteyên bi motor di riyên taybetmend/prîvat re jî bajo. Li riyên weha qarmeyên qedexekirinê hatine venandin. Lê mirov dikare di riyên prîvat re bimefle û piskulêtî jî bajo.



Kon û kerevan

Tu dikarî li nav surifltê çend rojan kon vegirî. Da ku tu ji bona demeke dirêjtir konê xwe an li nêzîkî xaniyan vegirî; divê tu ji xwediyê erd biprsî û destûrê bigirî. Herweha jî ji berî ku tu kerevan an xaniyê awtomobilî li ber riyêke taybetmend / prîvat dayînî, bi pirsar destûrxwestinê rabe. Nabe ku mirov kerevanê an xaniyê awtomobilî li nav erda surifltî bajo, bo nimûne li kenarên avan an erdên bi çîmen û çandî.

Li ser avê

Tu dikarî li qeyîqê siwar bibî, bi miweqetî li ber kenara avê girêbidî, dakevî ser refliyayê û li ber kenarên avê avjeniyê bikî, lê ne li nêzîkî malan. Bala xwe bide deverên qorîkirinê yên çûkan hin cihên din hene, ku nabe tu li wir li ser avê bimînî an dakevî ser refliyayê û bimeflî. Cihên weha bi qarmeyan hatine nîflankirin.



Masi

Tu dikarî serbest bi çengelê rawestiyî, çengelê avêtinê û melzemeyên din yê bi destan bi dirêjîya kenarên deriyayê û li pênc deriyaçeyên mezin li Swêdê bi masî-girtinê rabî; bê ku tu ti xercê bidî. Da ku mirov bi masîgirtinê ji avên din rabe, kerta masiyan an destûrgirtinê xwestin. Masîgirtina serbest; girtina masiyan bi torê, girtina bi vekirina qulekê di qeflayê de û xistina masiyekî mirî an tifttekî din ser çengelê bê ku mirov li wir bimîne, girtina bi gelek çengelan û rakêflandina wan li pey qeyêqê an çengelekî ne di nav de ye. Herweha girtina masiyên laks li kenarên Bakur (Norrländskusten) jî ne di nav de ye.

Seg û nêçîr

Destên xwe mavêje hêlîn û çêlikên heywanan. Brîndaririn an acizkirina heywanên hov û kovî qedexe ye. Dema ku heywan çêlikan vedikin, nabe ku seg li nav surifltê di navbera 1 adarê - 20 tebaxê de serberdayî baz bidin. Hertweha di demên din de jî; pêdivî ye; ku mirov bi çavdariya segan rabe û ha ji wan di nav surifltê de hebe. Li gelek deverên bêhinvedanê û li giravan; normal û pêdivî ye; ku seg ne serberdayî bin.

Agir

Bi piranî li havînan agirdadan qedexe ye. Hîngê hemî agirdadan li çolê - tevî li cihên taybetî yê agir jî qedexe ye. Bê vê divê mirov gelekî ha ji agirdadanê hebe. Bi temamî agir li pey xwe vemirîne! Yekser li ser teht û latan agir pêmexîne- ew diderizin û diteqin!

Berê daran, kuvarik (kumik), gul û çîçek

Tu dikarî berê daran û kuvarikan li çolê; lê ne yê qorî (parastî) berhev bikî. Lê nabe ku bê dsetûrgirtin tu dar an çapanan bibirî, fiiqin û çiqliyan biflkînî, damarên daran ji xwe re rakî an bi awayekî din daran birîndar bikî.

Gemarê bi xwe re bibe!

Qedexe ye; ku mirov gemarê, dîndoqên (cam) flikestî, qutî, plastîkê, benikê neylonî yê masîgirtinê û gemarên din yê ko jiyanê li nav surifltê xerp dikin bavêje derî xaniyan. Herweha dibe ku ew bi ziyandariya mirov û heywanan jî rabe.

Qanûna parastina surifltê

Di qanûna parastina surifltê de ya ji bona baxçeyên tevayiyê û suriflta qorîkirî qaîdeyên taybetî berdewam in, ku ew sînorekî ji mafê tevayiyê re datîne. Herweha dibe ku qaîdeyên deverîn jî ji baona cihên bêhinvedanê hebin. Ev nîflana ha ya qanûna parastina surifltê ye.



Agehdariya pirtir

Ger tu agehdariya pirtir bixwazî, ku çî berdewam e, tu dikarî riya xwe bi komûna xwe xînî.